



Australian Government

**COVID-19**  
VACCINATION

# Piştî vaxslêdana we ya Spikevax (Moderna) COVID-19

Wexta nûvekirina dawîn: 2-ê Îlona 2021

## Derheqa vaxsînê de

We îro **vaxsîna Spikevax (Moderna)** li xwe da.

Ev vaxsîn dikare mîrovan ji nexweşîna ji ber COVID-19 peyda dibe biparêz e. Hewce yî bi dû dozan heye, bi asaîyê di navbera 4-6 heftanda ev têye lêdan ( ev navberok bi gorî mercên tayîbetî dibe kê were dirêj kirin). Di nav vê vaxsîna Moderna COVID-19 de vayrûsa zindî tune ye, û ewê nikaribe COVID-19 bide we. Ev ji kodên genetîk ên beşên girîng bo beşên SARS-CoV-2 kû jêre proteyîna qilçik têye gotin. Biştî wergirtina vê vaxsînê, bedena we kopyakî proteyîna qilçik çêdik e. Dûrre wê pergala parazîya we wê fêrî nasînê bive û li dijî vayrûsa SARS-CoV-2 ku dibe sedema COVID-19 şer bike. Kodên genetîk bi awayek zûtirîn ji alîyê bedena weda dişikên.

## Biştî vaxslêdanê lêvîya çî bin

Mîna her vaxsînan dibe piştî wergirtina vaxsîna COVID-19 hesasîyet bi were peyde bikin.

Piştî lêdana **Moderna** hasasîyetên **hevpar** wê ev bin:

- êş li cîhê derzîyê
- betîlandin
- serêşî
- êşa masûleyan
- ta û serma
- êşa movikan.

Piştî derzîya **Moderna** hasasîyetên **sivik ên hevbeş** evin:

- sorbûn û werimandin
- nazikî an jî werîmandina binê mil
- vereşandin
- firehbûna girêkên lîfan.

Van bandorên hesasîyetan bi gelemperi sivik in û di nav du an sê rojan de hûnda dibin. Wexta mîrov dide berhev dibe hinek kes wê tecrûbên wek a semptomên grip a gira ji vê vakslêdanê werbigrin bi gorî ew vaksînên hevpar û dibe kû bo rehetîyê wê hewce hebe ji çalekîyên normal bo demekî dûr bimînin. Îşaretê vê piştî herdû dozan lê piranî piştî doza dûwemîn dîyar dibin.

Heke piştî vaksînê êş li cîhê derziyê an agirê we rabû, serêşî and jî laşê we da êş peyda bû, hûn dikarin ev dermanê êş kûjê wek paracetamol an ibuprofen werbigrin. Ewê yarmetîya kêmbûyîna ew semtomên binav bûne bike. Ne hewceye hûn berî vakslêdanê paracetamol an jî ibuprofen bixun. Heke li cîhê vaksînê wrmandinek hebe, hûn dikarin cemedê bidin ser.

Hesasîyetên **kêm** piştî vaksîya **Moderna** yê hatine ragîhandin ev in:

- reaksiyona alerjîya giran (anaphylaxis).
- mîyokarditis ( emflemasyona adelên/masulkên dil) û pericarditis (emflemasyona/kûl ên li ser dervayê dil) Piranîya pêkanên hatine ragîhandin sivikin û zû baş bûn e, Lêbelê şopandina van a bo çavderîyê bo demên dûr û dirêj in. Piranîya van pêkanan biştî doza diwemîn diqewimin û zêdetir bi zilamên temen ciwan ên (ji 30 salî piçûktir) peyde dibe.

Divê piştî vakslêdanê daxwaza yarmetîyek bişîjkî biki heke:

- hûn difikirin ku we reaksiyonek alerjik heye. Tîlefona 000 bikin heger nîşanên giran hebin, wekî dijwariya nefsgirtin, xîzxişk, lêdana dil a bilez an ji hilweşîya bi xwarê da
- li ser singe we êşek and dewsinêk hebe, an kulpîna dil a ne asayî, lêdan an 'lerzîn' heye, bêhna we tê çikandin and teng dibe an êş di dema standin û berdana nefesê da heye
- xemgînîya we di derheqa îhtîmalek mezi a hesasîyetê û bandorên wê an ji semtomek bê guman de heye
- bandora hesasîyetek bêguman ji ber vaksînê heye, kû piştî çend rojan wenda nebûye.

Ji bo stemtom/îşaretên sivik kû ne acîlin, hûn dikarin pêşkêşkarê asayî ên bijîşkîyê (bi taybetî wê diktorê we ê malbatê be)

## Çavdêriya ewlehiya vakslêdanê û ragîhandina bandorên hesasîyetê

Hûn dikarin bandorên neyînî yên gumanbar ji pêşkêşkarê xwe ê vakslêdana xwe an ji ji pisporê tenduristiyê yên din re ragîhînin. Dûv re ew ê li ser nave we bi fermi ragîhandinek bo beşa tenduristîya wilayet an herêma we re an ji wê raste rast ji The Therapeutic Goods [Rêvebirîya Eşyayên Tedawiyê] (TGA) re bişînin.

Heke tercîha we ku hûn bi xwe reportê rabîgîhînin, bi kerema xwe serdana vê malperê bikin [reporting suspected side effects associated with a COVID-19 vaccine webpage](#) li ser malpera TGA kilawiza rêberîya li ser rûpelê bişopînin.

## Testa bo COVID-19 piştî vakslêdanê

Hînek semtomên hesasîyeta vaksîna COVID-19 dibe her wek ewên ji ber COVID-19 peyda dibin (w.m. ta/agir). Herweaha di nav Moderna qet vayrusa zîndî tune û nikare bibe sedema COVID-19. Dibe hewce nîn be hûn testa COVID-19 çêbikin an ji xwe îzole ango dorxwe bigrin:

- heke hûn di nav di nav du rojên pêşînde piştî vaksînê bi awak gelemper rastî semtomên wek agir serêşî, westandin bûn, û
- heke hûn piştrast in ku we ti nîşanên nefesê tune (minakî, herikandina poz, kuxik, êşa gewrîyê windabêna bêhnê an ji kêmbuna tame).

Lêbelê, dive hûn rêwerzên heyî yê welayet/herêma xwe ji bo agahdariya herî nûvekirî bişopînin. Ev şîret dibe kê ji ber bûyera derketina COVID-19 de li devera were guhastin. Ger hûn pîvanên din bicîh bînin jî wê hûn jî hewce bike ku hûn ceribandinek COVID-19 çêbikin, mînakî ger hûn têkildarê nêzîk a pêkhatîya COVID-19 ne. Heke hûn şik bi were heye li nixandina bijîşkî bigerin.

## **Hevdîtina xweya duyemîn bînin bîra xwe**

Girîng ku hûn du dozen Moderna li xwe bidin. Van dozan bi gelemperi di navbeyna 4-6 hefte ji hev dûr tene lêdan, lê belê ji ber reşên taybetî de navberên dirêj bêne pêşniyar kirin. Doza duwemî wê pêkan be ku parstina we li dijî COVID-19 dirêjtir bike.

## **Ew agahdarîyên we di hevpeyvîna we da wê çawa bêne bikar anîn**

Ji bo agahdariya ka meriv çawa hûrguyên weyên şexsî tene behev kirin, hilanîn û bikar anîn, biçin <https://www.health.gov.au/using-our-websites/privacy/privacy-notice-for-covid-19-vaccinations>